Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

# Makezagon

Bingeha pêkvejiyana me



# Derbara vê belavokê de

Destpêkirina jiyanê li Elmanyayê bi rastî ji we re rehet nîne. Hûnê rêjeyek mezin ji agahiyê n nû bi dest bînin. Û gelek tişt ji we re biyanî ne. Bi vê belavokê emê alîkarîya we bikin ku jiyana li Elmanyayê çêtir çê bikin û fêm bikin.

Di rûpelên pêş de hûnê makezagon û wateya vê bo kesên li Elmanyayê dijîn – di nav de hûn bi xwe jî – nas bikin. Hûnê hinek maf, û berpirsiyên xwe nas bikin. Di gel wan, jin û mêrên ku hinek bixwe koçberî Elmanyayê bûne, ji we re tê liser makezagonê agahiyan radest bikin. Armanc pêşkêşkirina nêrîneke destpêkî ye derbara zagonên balkeş da. Di pêşerojê da – wek mînak di qonaxa entegrasyonê/tevlêbûnê da – hûn ê hûrgiliyên zêdetir ji naveroka destûra bingehîn nas bikin.

Naskirina makezagonê ji bo welatiyên Elmanyayê jî girîng û balkêş e. Îcar gava hûn ji beşek ji naverokê tê negehîştine yan hûn dixwazin ku li ser biaxivin, ji axaftina bi kesên li dora xwe şermok nebin.

Em ji we re demên baş hêvî dikin!

# Lîste


Makezagon çi ye? .......... 5

Şerefa mirov destnedanbar e .......... 9

Azadiya mirovan .......... 13

Wekheviya li pêşiya zagonê .......... 17

Wekheviya zayendî .......... 21

Qedexekirina cudakarî .......... 25

Azadiya bawer û olê .......... 29

Azadiya axaftin û Çapemeniyê .......... 33

Zewac û Malbat .......... 37

Berpirsî li Elmanya .......... 41




# Makezagon çi ye?



*“Ji min re makezagonê torek e ku civaka me bi hev re ragirtiye. Tişta herî girîng ji bo min parastina kêmaniyan e. Piraniyan her tim zêdetir desthilat hene. Lê belê makezagon ji çawaniya kiryarra wî li gel kêmaniyan tê nirxandin. Ez dizanim ku li Elmanyayê: Heta ku di çarçoveya makezagonê da bimeşim, ez bi awayekî ser esasa aşopên xwe bijîm.”*

*Ute, 50 salî*

# Makezagon çi ye?

Weke piraniya welatên dinyayê, Elmanya jî bi makezagon e. Ev zagone di sala 1949 çar salan piştî dawiya desthilatdariya Partiya Neteweyî ya Sosyalîst, bi daxuyaniya bin navê mafên bingehîn da hate damezirandin – di domahiyê de hûnê hinek ev babetane nas bikin.

Mafên bingehîn ji hemû zagonan bilindtir e. Ew jî aliyekê mafên welatiyan li hember dewletê saz dike: Ji bo nimûne, ji polîsan re destûr nayê dayîn ku bi hêsanî bikevin malekê, belke pêwîstî bi îzna dadgehê heye. Li aliyê din mafên bingehîn çawaniya kiryarra me li gel hev li Elmanyayê diyar dike: Jin û mêr wekhev in, tu kes maf tune ye ku bi sedema netew, ol yan jî meyla cinsî bikeve ber cudakariyê. Dewletê divê mafên bingehîn yên hemû gelê biparêze,

bê berçav girtina vê yekê ka nefş bi nefiş di vî welatî de jiyane an jî nû livir koçber bûne.

**Makezagon vê demê nirxdar e ku em hemû bala xwe bidin. Nirxên xwe ne tenê bingeha welatê me, belkî bingeha pêkvejiyana me ye. Ji ber ku maf û erkên ku li jêr da tê şirovekirin di nava hiş û dilê gelê me bi cî bûne, ji bo deh salan, aştî, azadî û serfirazî li Elmanya hate damezrandin.**

**Agahiyên zêdetir**

Tu dikarî makezagonê bi belaşî ji malperên Parlemana Elmaniya daxîn bikî yan ji bo download an jî sipariş bikî: **www.btg-bestellservice.de**

Ev makezagone bi zimanên Inglîzî, Fransî, Spanî, Polandî, Tirkî Portugalî û Erebî de berdest e.



MADEYA 1

# Şerefa mirov destnedanbar e

(1) Şerefa mirov destnedanbar e. Guhdarî û piştgirî ya vê liser milê desthilatdariyê ye.

(2) Ser vê esasê netewe Elmanyayê destnedanbarbûna mafên mirovan bingeha her civaka mirovan, aştî û edaletê li cîhanê dizane.

(3) Mafên bingehîn ên jêr desthilatên zagonsaz û bicihanîn û dadweriyê, wekî zagona bibandor, sînordar dike.

MADEYA 1

# Şerefa mirov destnedanbar e

Parastina rûmeta mirovan de pêşanî ya makezagonê da ye. Hecetên baş ji bo vê babetê hene: Hê demeke dirêj derbas nebibû ku Sosyalîstên Netewî li Elmanyayê û li seranserê Ewropayê ji ber olî, netewî, an baweriyên siyasî ketine ber dozgeriyê, zilm û işkencê û bi milyonan hatine qetilkirin. Ewan rûmeta van kesan bi awayên cuda binpêkirin.

Ji bo rêgirtin ji dubarebûna van tawanane di welatê me, rûmeta mirovan bû tewereya sereke li makezagona Elmanyayê. Parastina vê di makezagonê da nirxa herî bi qedr e. Hemû mafên din li ser rûmeta mirovan hatiye bingehkirin.

Jiyana bi rûmet li Elmanyayê eve ku hemû kes xwedî maf û parastineke wekhev bin, bê berçav girtina rengê çermî, netewe, ol, temen, zayend, rewşa civakî an şiyana fîzîkî û derûnî. Herwiha,



> *“Piştî ku lîse bidawî bû ez çûme Elmaniya. Li welatê xweyê berê ez her tim ji polîsan bi tirs bûm, tevî ku ez tûşî tawanekê nebibûm. Li vir rêz ji min tê girtin, heta ji aliyê nûnerên hikûmetê û ev ji bo min pir bi nirx. Li vir gel hemû kesan bi rewşa ku kêrhatiye, kiryarr tê kirin. Ev li gorî min yek ji tiştên herî girîng e.”*
>
> *Hamed, 33 salî*

ev tê wê wateyê ku hemû kes têr xwarinê bixwe û mal hebe, alîkariyê bistînin gava ku ew nexweş in û bikarin biçine dibistanê.

**Hikûmeta Elmanyayê xwedî wezîfeyeke ji bo rûmeta hemû kesan li Elmanyayê dijîn bigire û jê biparêz e. Ji ber vê yekê, divê dewlet ji hemû tiştên ku dikarin rûmeta me bêxne tahlûkeyê dûr be. û herwisa me lihember rûreşî, zilm tacîz ji aliyê kesên din, biparêze.**

### Agahiyên zêdetir

"Hevpeymaniya ji bo neteweperestiya kozmopolît, demokrasiyê û desthilata zagonê – dijî bêtehamuliya, neyartî an şidetê" (Allianz für Weltoffenheit, Solidarität, Demokratie und Rechtsstaat – gegen Intoleranz, Menschenfeindlichkeit und Gewalt) ji saziyên olî, sendîkayên karmendan û xwedîkaran pêk hatiye. Ev bi dirûşma "şerefa mirov destnedanbar e" ji bo Elmanyayek vekirî li hewldanê ne.

Dirûşma vê ciavtê li vê derê, tu dikarî di zimanên cuda peyda bikî:
**www.allianz-fuer-weltoffenheit.de**



MADEYA 2

# Azadiya mirovan

(1) Herkes maf heye ku şexsiyeta xwe, heta ku mafên kesên din binpê nebe û ji desthelata ku mafê bingehîn destnîşan dike û an ji kodên exlaqî ziyanê negehîne, bi serbestî geş bike.

(2) Herkes maf jiyanê û mafê destnedanbarbûna şerefa xwe heye Azadiya şexsî parastî ye. Di ev mafî de, tenê dikarin li gor destûra zagonî tê da mudaxeleyê bikin.



*“Dema ku ez 13 salî bûm, malbata min koçî Elmanyayê kirin . Azadî ya ku me li vê derê heye, di destpêkê de ji min re balkeş bû. Di dema borî de, her tişt ji bo min hatibû dîzaynkirin, û niha min bi xwe biryara gelek tiştan digirt. Azadî jî tê wê wateyê ku herkes berpirsê jiyana xwe ye.”*

*Klaudia, 38 salî*

MADEYA 2

# Azadiya mirovan

Mafên bingehîn yên azadî ya mirovan jî dizivire ser dema sosyalîzma neteweyî. Şîdet, teror û girtina sîstematîka kesên, divê li her demê bê astengkirin. Her cezayê girtîgehê, divê di warê dadweriyê bê rastdarkirin. Nabe di girtîgehan da kes bê çewisandin an jî işkencekirin. Li Elmanya cezayê mirinê tune ye.

Prensîba duyemîn a makezagon jî mafê pêşvebirina azadiya şexsî dupat dike. Mebest mafê jiyanê bi awayekî ye ku kesek dixwaze. Her mirovek mafdare ku karê xwe, berjewendiyên xwe yan jî hevjînê/a xwe bi azadî hilbijêre. Ji ber vê yekê, li Elmanyayê hevjînên hevregez tam mîna hevjînên din hurmet hene. Herwisa, eger jin, yan jî mêrek, ji bo nimûne, bijarê ku qûntara dirêj an şalê kurte li ber bike, di vê babetê de bi tevahî serbest e.

Bê guman, pêşveçûna şexsî sînor dare. Ev pêşketina heta astekê izindare ku kiryarra şexsî, kesek din neyêxe tehlûkeyê, zerarê negehîne wan û birîndar neke. Du mînakên zelal: Tenê ji ber ku kesek hezî ajotina bi lez dike, izin tune ye ku di bajêr de bi leza ne zagonî, biajo. Divê ew baldarî ya sînorên lezê bike. Ev zagon e ji bo parastina xelkê dine ku li veguhestina bajêrî da beşdarin. Kêşana cixareyê her derê serbest nîne, ji ber ku ev mafê kesên din jî ji bo tenduristiyê dêxe metirsiyê.

**Herweha azadî cem xwe hinek berpirsyariyan jî diafirîne. Ev berpirsiyariye pêk tê ji hurmet û xweşdîtina giyandarê din ên ku ji gel fikra wî neguncaw e.**

### Agahiyên zêdetir

→ Civata hevzayendî ji Elmanyayê (Lesben- und Schwulenverband in Deutschland, LSVB) di malpera jêr bi zimanên cuda ji bo penaberan zanyarî amade kiriye: **www.queer-refugees.de**

→ **“Evîn hêjayî rûmeta e”** belavokeka agahiya ne li ser hevzayendî ye ku ji aliyê Navenda Koçberan û Hevzayendiyan (Zentrum für Migranten, Lesben und Schwule, MILES) berhev bûye. Ev belavokê dikarin bi zimanên cuda ji vir daxîn bikin: **berlin.lsvd.de/projekte/miles**




MADEYA 3, BEŞÊ 1

## Wekheviya li pêşiya zagonê

(1) Hemû kes li ber zagonan wekhev in.

(2) Mêr û jinan xwedîyê mafên wekhev in. Dewletê wezîfeya pêkanîna wekheviya zayendî li navbera jin û mêran heye û ji bo cudakariyê heyî li hewldanên da ye.

(3) Tu kes nabe bi sedema zayendî, etnîkî, nijad, ziman, welatê zikmakî, bawerî an baweriyên olî û siyasî bikeve bin helwestên bînrawe yan tercîhker. Nabe tu kes ji ber seqetî bikeve ber cûdakariyê.



*“Çend sal berê min bazda, ji bo Elmanya. Yek ji hecetên bazdana min ev bû ku di welatê min hinek kesan rê dida xwe ku her karî bikin – tenê ji ber ku ew endamên malbat an jî komeke siyasî ya taybet bûn. Li vir, li Elmanyayê, tu kes nikare di dadgehê de xwe ji min bilintir bizane an jî jiyana xwe ji min binirxtir bizan e.”*

*Hamado, 41 salî*

MADEYA 3, BEŞÊ 1


# Wekheviya li pêşiya zagonê

Li makezagona Elmanyayê hatiye nivîsîn: “Hemû kes li ber zagonê wekhev in.” Ev hevoke tê wê wateyê ku, gotinên mirovek feqîr di dadgehê da tam bi qasî peyva kesek dewlemend hêja ye, peyva jinê tam bi qasî gotina mêrekî hêja ye. Li Elmanyayê, ji bo nimûne, kesên bêkar li dadgehê gazî dikin û mafê xwe distînin, Rêveberê giştî ji ber binpêkirina zagonê tawanbar dibin û dikevin zîndanê. Dadgeh serbixwe ne rê nayê dayin ku bikevine ber bandora siyasetê. Hemû biryarr li gor ev zagonan tê girtin ku ji bo hemû kesan liber digirin. Ev prensîpa bingehîn a demokrasiya me ye.

Prensîba “wekheviya li pêşiya zagonê” ji bo hemû qadên jiyanê nirxdar e. Ev ji bo nimûne tê wê wateyê ku zarokên ne rewa nabe li hember zarokên rewa bikevine ber cudakariyê. Yan eger hevjînên hevzayind jiyana xwe ya hebveş bi di nivîsgeha têkildar de, tomar kiribin, mafên mîrasa zagonî hene.

Wekheviya li pêşiya zagonê tê wê wateyê ku penaberan jî mafên bingehîn hene. Ew jî mafdarin ku berhingarî ya biryarrên dewleta Elmanyayê bikin.

**Ji ber ku her kes bikare ku mafê xwe biparêze, kesên belengaz dikarin ji bo dana xercên dadgehê û parêzer alîkarî bistîne. Lê belê tenê vê demê ku gaziya yan wan gengaziya serkeftinê hebe.**



MADEYA 3, BEŞÊ 2

# Wekheviya zayendî

(1) Hemû kes li ber zagonan wekhev in.

(2) Mêr û jinan xwedîyê mafên wekhev in. Dewletê wezîfeya pêkanîna wekheviya zayendî li navbera jin û mêran heye û ji bo cudakariyê heyî li hewldanên da ye.

(3) Tu kes nabe bi sedema zayendî, etnîkî, nijad, ziman, welatê zikmakî, bawerî an baweriyên olî û siyasî bikeve bin helwestên bînrawe yan tercîhker. Nabe tu kes ji ber seqetî bikeve ber cûdakariyê.

MADEYA 3, BEŞÊ 2

# Wekheviya zayendî

Serokwezîrê me xatûna Angela Merkel nîşan dide ku: Li Elmanyayê jin dikarin hema bi qasî mêran bi pêşve biçin. Ew biryarê digirin ka çi karî bikin – çi hemşîre, çi endezyar û çi leşkerî. Herwisa ew liser liberkirina kincan, zewac û anîna zarokan bi xwe biryarrê digirin. Li aliyê din, gelek mirov li malê û xwedîkirina zarokan de beşdar dibin. Ev tê wê wateyê, wekheviya zayendî ji bo me.

Civaka Elmanî bi dijwarî de hewlê da ye ku derfetên wekhev ji bo jinan û mêran dabîn bike. Li vir jî heta dehika 70ê gelek sînor hebûn: Ji bo nimûne, jinan destûr tune bûn ku bêyî izina



*“Ji zaroktiya xwe ez hîn bûme ku karê malê ser milê jinê ye. Lê belê, ez û jina xwe karan bi hev re parve dikin. Ez jî amana dişûm, ez jî paqijî dikim, ez jî utî dikim û kirrînê dikim. Dema ku hevjînê min westiyayî bê mala û min bo xwarinê çi tiştê çênekiribe ez hest gonehkîyê dikim. Alîkarî li mal ji bo min normal e.”*

*Keli, 67 salî*

mêrê xwe bixebitin û qet izina bo sermaya wan hebû. “Tevgera Jinan” ev rewş guherî. Ev tevgera guherîneka giştî di bawerên civaka Elmanî de çêkir: Êdî jin bi tenê li ser rola kevaniya malê û dayîkatiyê ne bûn.

**Îro jî tiştên ku divê bê baştirkirinê, hene. Lê dewlet hewl dide ku jin û mêran di tevahiya beşn jiyanê da şansên wekhev hebin – çi di jiyana şexsî, çi di kar û çi di malbatê.**

### Agahiyên zêdetir

→ Agahiyên zêdetir li ser wekhevîyê li ser malpera Wezareta Netewî ya Malbat, Pîran, Jin û Ciwanan (Bundesministerium für Familie, Senioren, Frauen und Jugend) dê bibînin: **www.bmfsfj.de**

→ Telefona “Tundiya li dijî jinan” ji jinên ku rastî şîdetê hatine şîretan dide. Eger wergêrr pêwîst be, hevdem bi 15 zimanan di axaftinan de tê bikaranîn: **+49 (0)800 011 60 16** (her roj û wek şevûroj)



MADEYA 3, BEŞÊ 3

# Qedexekirina cudakarî

(1) Hemû kes li ber zagonan wekhev in.

(2) Mêr û jinan xwedîyê mafên wekhev in. Dewletê wezîfeya pêkanîna wekheviya zayendî li navbera jin û mêran heye û ji bo cudakariyê heyî li hewldanên da ye.

(3) Tu kes nabe bi sedema zayendî, etnîkî, nijad, ziman, welatê zikmakî, bawerî an baweriyên olî û siyasî bikeve bin helwestên bînrawe yan tercîhker. Nabe tu kes ji ber seqetî bikeve ber cûdakariyê.



*“Ez bixwe berpirsyarê karmenda me. Em di reklamên kar da piştrast dikin ku Em ji vergirtina daxwazên ji bo kar ji kesên bi eslê xwe koçber şa dibin. Tîma me gelekî cihêreng e ji neteweyên: cûda, jin û mêr, ciwan û pîr. Ji bo nimûne, eger jinek xavik liserê xwe kiribe, ev babete eger şêyanên pisporîyê wê ligel rewşa şolê guncav be, nabe astengek bo çûna we ser karî. Ji mere kesayetiya mirovan girîng e.”*

*Felice, 46 salî*

MADEYA 3, BEŞÊ 3

# Qedexekirina cudakarî

Cudakarî di navbera mirovan li Elmanyayê qedexe ye. Nabe tu kes bo nimûne, ji ber ku li derve ji dayik bûye an jineke reş e, rastî cudakariyê bê. Çi bo peydakirina kar, çi ji bo lêgerînê ji bo xanî, yan dema têketina li restaurantê: Divê prensîba mirovahiyê esas bê girtin ne zayende, etnîk, bawerî, meyldariya zayendî, nêrînên siyasî yan seqetî.

Lê belê, mixabin, di civaka me de hinek babetên cudakarîyê hene. Lê ew ji mafê me ye ku bi wekhevî bi me re kiryar bê kirin: her kesî ye hest pê kir ku rastî cudakarîyê hatiye, ji bo nimûne,

dikare bo şêwirmendiyê serdana navenda dijî cudakariya eyaletê bike.

**Dewletê erk heye ku kêmaniyan li dijî cudakariyê biparêze. Lê belê em bi jî berpirsin ku rêzê ji xelkê bigirin. Ev bingeha pêkvejiyana me ye: Ji bo vê yekê, li Elmanya, ji bo nimûne, jinek dikare bibe serokwezîr yan siyasetvanek bi eslê xwe xelkê Tirkiyê, dikare bibe serokê partiyekê.**

### Agahiyên zêdetir

→ Eger li ser cudakarîyê pêdiviya we be alîkarîyê heye dikarin gel Rêveberiya Neteweyî Tekoşîna li dijî Cudakarî (Antidiskriminierungsstelle des Bundes, ADS) yê, pêwendiyê bigirin:

Telefona şêwermendiyê:
**+49 (0)30 1855-1865** (Duşemê heta Înê, demjimêr 9 heta 12 û 13 heta 15)

Telefona xizmeta ji bo pirsên giştî:
**+49 (0)30 1855-1855** (Duşemê heta Înê, demjimêr 9 heta 12 û 13 heta 15)

Email: **beratung@ads.bund.de**

→ Dikarin navendên şêwermendiyê jî li ser malpera Navenda Tekoşîn li dijî Cudakariyê bibînin: **www.antidiskriminierungsstelle.de**



MADEYA 4

## Azadiya bawer û olê

(1) Azadiya bawerî û wijdan û azadiya baweriya olî an ramanî li hember destdirêjiyê tê bên parastin.

(2) Pêkanîna bê midaxale ya rêûresmên ayînî parastî ye.

(3) Tu kesî nikarin li dijî wijdana xwe ji bo xizmeta leşkerî ku pêdivî bi bikaranîna çekan heye, mecbûr bikin. Naverrok ji aliyê zagona federal diyar dibe.



*“Di serî de, dema ku ez hatim Elmanyayê, min bawer dikir: Xelk qet ol perest nîne. Lê bi bihorîna demê min fêm kir ku ol tiştekî şexsî ye. Ji bo cara yekem min malbatek naskir ku endamên wan bawerî bi tiştên cuda hebûn, an jî bawerî bi tu tiştan tune bûn. Di mala min de hertim hemû endamên malbata yek bawera olî hebûn. Ev serdanê bala min kişand.”*

*Ivona, 38 salî*

MADEYA 4

# Azadiya bawer û olê

Elmanya dewletekî laîk e. Ev tê wê wateya veqetandina dîn û siyasetê. Dewletê bixwe ola fermî tune ye û ji bo welatiyan çi olî ferz nake. Berevajî: Li gorî makezagon ê, divê dewlet piştrast be ku hemû kesan di Elmanyayê da bêyî pirsgirêk olê xweyê dilxwaz, pêk dînin.

Nêzî 60 ji sedî ji xelkê Elmanyayê endamên dû dêrên Krîstiyan ne, û ji wan, hema hema nîvî Katolîk û nîvî endamê deyra Avanglîk in. Bi wî awayî Krîstiyan di Elmanyayê ji olên din bihêztire. Gelek dezgehên civakî wekî nexweşxane an baxçeyên zarokan, ser bi rêxistinên Krîstiyana ne. Gelek betlane di Elmanyayê da di kokên xwe da Krîstiyanî ne. Di nava van de dikarin Cejna Qiyametê û Kirismisê nav bibin.

Azadiya olî li Elmanyayê de herwiha azadiya guhertina olê jî liber digire. An jî dikarin ti olan bawer nekin. Yek ji sisyan ji xelkê Elmanyayê endamê ti dêran nînin. Ji bo gelek kesan baweriyên olî roleke giring di jiyana rojane de tune ye.

Ji ber ku Elmanya welatekî mêvandar e, li vir gelek olê hene. Piraniya Elmanî, îro merasîm û pîrozbahî yên wek Hanukah an jî Cejna Qurbanê nas dikin. Dêr û mizgeftan li gelek herêman beşek in ji wêneya bajarî ne. Misilman nêzî pênc ji sedî ji tevaya welatiyan, koma herî mezin piştî Krîstiyan ne. Hejmarek mezin jî Cihû, Budîstanî û Hindû li Elmanya dijîn.

**Hemû mafdarin ku merasîmên wanyê olî, bê berçavgirtina ola ku bawer dikin, bi serbestî birêve bibin. Çend pêdivî: Rê û resim divê bi zagona Elmanyayê hevgirtî be.**

### Agahiyên zêdetir

Malperê hinek civatên olî di Elmanyayê:

- Dêra Avanglîk li Elmanya (Evangelische Kirche in Deutschland): **www.ekd.de**
- Dêra Katolîk li Elmanya (Katholische Kirche in Deutschland): **www.katholisch.de**
- Konferansa Keşîşên Ortodoksê li Almaniya (Orthodoxe Bischofskonferenz in Deutschland): **www.obkd.de**
- Konseya navendî ya Cihûyan li Elmanya (Zentralrat der Juden in Deutschland): **www.zentralratdjuden.de**
- Lijneya Koordînasyona Misilmanan (Koordinierungsrat der Muslime): **www.koordinationsrat.eu**
- Civaka Îslamî ya şîî li Elmanya (Islamische Gem. der schiitischen Gemeinden Deutschlands e. V.): **www.igs-deutschland.org**
- Ahmadiyya Muslim Jamaat Deutschland: **www.ahmadiyya.de**
- Civaka Elewiyan li Elmanya (Alevitische Gemeinde Deutschland e. V.): **www.alevi.com/de**




MADEYA 5

# Azadiya axaftin û Çapemeniyê

(1) Herkes mafê azadiya fikr û ramanê xwe bi serbestî pê axaftin û nivîsandin û weşandina wêneyan bêje û belav bike û bê astengî pê jêderên ku ber destê herkesî ne agahiyan xwe zêde bike. Azadiya çapemeniyê û azadiya weşana nûçan pê radyo û film an parastî ye. Li wê Derê sansor qet nayê qebûlkirin.

(2) Ev mafene ji aliyê zagona giştî û biryarên zagonîyê pêwendîdarî parastina ciwan û ser esasa mafê destlênedayîna rûmeta şexsî gengaze bê sinordarkirin.

MADEYA 5

# Azadiya axaftin û Çapemeniyê

Hemû kesan li Elmanyayê izindarin ji bo ramanên xwe bi azadî bêjin. Ev tê wê wateyê ku her kesek dikare nêrîna xwe bêje û tiştên ku napejirîne rexne bike. Ji ber vê kombûn, xwenîşandanên û rêpêvanên aştiyane yên komên civakî yan siyasî di civakê de gelek caran tê dîtin.

Li Elmanyayê de azadiya çapemeniyê heye. Gel dikare zêdetir ji 350 rojname û 1500 kovar, gelek torên radyo û televîzyonê û înternetê bo bidestanîna zaniyariyan bikar bînin. Siyasetmedarên izin tune ne ku biryarê bidin ka çi bê weşandin û çi neyê çapkirin. Makezagon me dibêje ku “Li wê derê sansor qet nayê qebûlkirin”. Di demokrasiyê me de hunermendan mafê bingehînê axaftina bi serbestî hene. Henek jî di nava ev mijarê da ye.



*“Dê û bavê min ji ber azadiya çapemeniyê koçberî Elmaniya bûn. Di welatê xwe da, ji rojnemeyan piştrast nebûn. Kesê nedigot ka di welat da çi diqewim e. Ez kêfxweşîm ku vir wisa nîne, tevî ku geş kes li gel rojnameyan hevrê nebin. Lê herkesekî ev derfete heye ku di nava nêrînên cûda da, nêrîna nêzîk nêrîna xwe bijêre.”*

*Kiki, 38 salî*

Lê belê, li Elmanyayê her gotinekê nikarin bêjin û biweşînin. Ji bo nimûne, eger kesek nêrîna xwe bêje û rasterast dijûnan ji kesekê bide yan nefret û şîdetê teşwîq bike, tê cezakirin. Herwisa înkarkirina qirkirina Cihûyan di dema Sosyalîstên Netewî tê cezakirin. Pirtûk yan fîlmêntaybet ku şideta zêde dihewînin, ji bo parastina zarokan bi tenê ji bo mezinan serbest tên berdan.

**Azadiya derbirînê û çapemeniyê ji bo demokrasiya me pir girîng e: Tenê dema ku em bi azadî ramanên xwe bêjin û bi azadî xwe bigihînin agahiyan, em dikarin di mijarên siyasî de beşdar bin. Ji bo nimûne, em di mijarên siyasî ya çalak bin an dengê xwe bidin.**

## Agahiyên zêdetir

- Dikarin nûçeyê bi 30 zimanan li ser malpera Deutsche Welle dê bibînin: **www.dw.com**
- Komxebata Medyaya Dewletî ya Komara Federal a Elmanyayê (Arbeitsgemeinschaft der öffentlich-rechtlichen Rundfunkanstalten der Bundesrepublik Deutschland, ARD) bernameyên xwe ji bo penaberan, di nav wan de nûçeyan, li ser malpera xwe berhevkirine: **refugees.ard.de**



MADEYA 6

# Zewac û Malbat

(1) Zewacê û malbat wê ji piştgiriya taybetî ya dewletê sûdê verbigire.

(2) Lênêrîna û Perwerdekirina Zarokên mafê xwezayî yên dê û bav û erka wan ya mezin e. [ … ]

(3) Veqetandina zarokên ji malbatên wan li dijî daxwaza kesê ku mafê perwerdehiya wan hene, tenê li gor zagonê gengaz e, [ … ].

(4) Her dayikê maf heye ku ji aliyê civakê bê parastin û lênêrînkirin.

(5) Zarokên ne Rewa [ … ] Bo pêşketina fîzîkî û hişî û statûya xwe di civakê de bi awayekî zagonî hemen parastinê verdigirin ku zarokên Rewa jê mifadar dibin.



*"Ev girîng e ku dê û bav li baxçeyê zarrokan û dibistanê de beşdar bibin. Ez li baxçeyê zarroka xwe da endamên konseya dê û bavan bûm. Dema ku zarokên min diçûn dibistanê û bi rêkûpêk ez di rêwîtiyên zanistîyê polê da gel wan hevrê bûm an di çêkirina kardestî yan da min alîkarî dikir. mamosteyan sipasî ya min dikirin. Ez bi vê yekê min baştir dibistan nas kir, pêwendî bi dê û bav din re kir û ez bi wî karî pir kêfxweş bûm."*

*Zaradasht, 55 salî*

MADEYA 6

# Zewacê û Malbat

Bav, dê û du zarokên – malbateke kevneşop demên dirêj li Elmanya bi wî şeklî bû. Lê îro ev ne tenê forma jiyana hevbeş e. Îro, hevjînên nezewicî û hevzayindyê bi an bê zarok, jin û zilamên ku bi tena zarokan mezin dikin û bi vî awayî malbatên tevlîhev gelek in. Li van malbatan de bi kêmanî yek ji dê û bavan zarokên xwe ji pêwendiyên berê tîne nav têkiliyeke nû.

Jin û mêrên ji çandên cuda an jî olên cuda li Elmanyayê da tiştek nenormal nîne. Jiyana bi tenê jî bi wîqasî normal e. Lê bi giranî malbata ji du kesan pêk hatine. malbatên mezin kêm in.

Dê û bav berpirsê zarokên xwe ne. Ew berpirsin ku zarrokên xwe perwerde bikin, bişînin dibistanê û tendurustiya wan misoger bikin. Şîdeta fizîkî li ber çavê zarokan – mîna zordariya li dijî hevbeşê jiyanê – qedexe ye. Bi piranî dewlet nayê di perverdekirina zarokan

da destêwerdanê bike, xênjî ku tenduristiya wan di tehlûkeyê de be. Bi wî awayayî Rêvberiya Ciwanan dikare destêwerdanê bike.

**Li Elmanyayê, gelek derfetên şêwirmendiyê ji bo malbatên ku gel pirsgirêk û zehmetiyan rû bi rû ne, hene. Ev derfetane dikarin bi rêya telefonê û bi dizîka bikar bînin. Tevahiya ev bername ji bo piştgiriya malbatan bo başkirina rewşa wan, hatine terxankirin.**

### Agahiyên zêdetir

- Telefona civaka piştgiriya ji zarokên li Elmanyayê bo dê û bavan (Deutscher Kinderschutzbund):
  **+49 (0)800 1110-550** (Duşem û Çarşem, demjimêr 9 heta 11; Sêşem û Pêncşemê, demjimêr 17 heta 19, belaş)
- Telefona Neteweyî ya Şêwra derûnî:
  **+49 (0)800 1110-111** an **+49 (0)800 1110-222** (şêv û rojane û belaş)
- Hejmara têkoşîna gel kederê (“Nummer gegen Kummer”):
  Ji bo Zarok û nûciwanan **+49 (0)800 1110-333**
  Ji bo dê û Bavan **+49 (0)800 1110-550**
- Navenda Şêwirmendiyê ya ji bo zarok û dê û bavan li nêzîkî ciyê xwe li vir hûnê bibînin: **www.bke.de**



# Berpirsî li Elmanya

# Berpirsî li Elmanya

Gelî li Elmanyayê maf û herweha erk hene. Bo nimûne dikarin babetên bi tevahî praktîk wekî erka radestkirina karta nasnameyê binav bikin: Kesên ku li Elmanya dijîn, bo nimûne, bi daxwaza polîs, dibe kesayetiya xwe pê pasaport yan belgeyên fermî yên din piştrast bikin. Penaxwazn jî pêdivî bi belgeyê fermî hene ku li navda agahiyên şexsî qeyd bibin. Ji bo nimûne, ev belgeye dikare, eger daxwaza penaberiyê hatibe pêşkêşkirin, destûra rûniştinê be.

Li gel vê, çûna dibistanê pêdivî ye. Divê dê û bav piştrast bin ku zarokên wan diçin dibistanê. Li Elmanyayê, zarok bi piranî ji şeş saliya xwe diçin dibistanê. Erka din erkê dana bacê ye. Ev tê



> *“Di destpêkê li Elmanyayê hûn bikevine ber pêleke ji zagonan. Hingê hûn bizanin ku her tişt hecetek heye. Bi naskirina wan girîng e. Mînakek sade: Divê her kes hewayê mala xwe biguherrîne, Heke na, tê kefik lê çê be. Ez guman dikim ku zagon li Elmanyayê pir mentiqî ne. Heke hemû kes wan pêk bîne, jiyana hêsantir dibe.”*
>
> *Alicja, 34 salî*

wateya ku, ji bo nimûne, baca dahat û xercên civakîyê mejane, divê bên dayîn. Pê vî diravî karên giringê giştî pêk tên: Dibistan tên avakirin, kolan tê çêkirin, park tê xwedîkirin û gelek tiştên din ên ku aramiya civakî li Elmanya zêde dikin.

**Divê her kes bi zagona tevbigerin û erkê xwe pêk bîne. Gelek kes karê wî karî bi dilxweşî pêk dînin, ji ber ku dixwazin civak baş tevbigere.**

# Têketina ji Elmanya




## Sepana Ankommen

Bi we re ji bo çend hefteyên pêşî li Elmanya

Agahiyên zêdetir li ser jiyan û pêvajoya penaberiyê li Elmanyayê û li ser kar û perwerdeya di sepana “Ankommen” da bibînin. Bi vê sepanê, herwisa hûn dikarin dest bi fêrbûna zimanê Elmanya bikin.

**Sepanê belaş daxîn bikin:**
www.ankommenapp.de

GOETHE INSTITUT

Bundesamt für Migration und Flüchtlinge

Bundesagentur für Arbeit bringt weiter.

alpha ARD Bildungskanal

# Agahiyên belavkirinê

*Makezagon – Bingeha pêkvejiyana me*

Belavker
Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
Referat Steuerung der Projektarbeit, Integration durch Sport, Informationsmanagement
Frankenstraße 210, 90461 Nürnberg

Jêder
Publikationsstelle des Bundesamtes für Migration und Flüchtlinge
www.bamf.de/publikationen

Çap
Silber Druck oHG, Niestetal

Dîzayn
KonzeptQuartier® GmbH, Schwabacher Str. 261, 90763 Fürth

Wêne/Mafê belavkirina wêneyan
KonzeptQuartier® GmbH, Schwabacher Str. 261, 90763 Fürth

Civata Nivîskarî
Lena Guntenhöner; OOMMEN OH! HOPPE – Büro für Kommunikation; Miltiadis Oulios; Referat Steuerung der Projektarbeit, Integration durch Sport, Informationsmanagement